

Ûsa dihat min ko her kuçê ko ji bin lingên qantir difirîn yek bi yek li dilê min diketin. Çavên min ji rê nedibûn û wek serxweşekî li ciyê xwe dinihêrtim.

Êvarê, gava pez, vedigeriyan guhê min ji kaş dengê bihîst. Gava min serê xwe rakir, min xanima xwe dîsa li ber xwe dît. Lê niha wek sibê delalî û çelengî ne dikir, lê ji tirsê dilerizî û ji sermê diranên wê dirikrikîn. Welê dixuya ko ji barana sibê çem rabûbû, Mijgan xwesti bû lê derbas be, avê bor ne da bû. Cilên wê şil bûn û çavên wê hêstir dikirin.

Hingûra şevê bû, êdî nikarî bû vegere. Min xwest dilê wê rahetbikim. Min got ê: "Çi xem e? Xanim şevên Tîrmehê kurt in, tu sebebên tirsê nînin, çavên xwe bigirî û vekî, sibê ye!" Paşê, zû min agirekî mezin dada. Mijgan sol û cilên xwe ziwa kirin. Piştê min jê re piyanek şîr, hinek penîr, nan û fêkî anîn. Lê eqlê wê ne li xwarinê bû, li hal û mala xwe digirî, bê hemdê min, çavên min jî hêstir kirin.

Bû şev. Min ji xanima xwe re di holikê de ji pûşan û ji postê berxekî paqij nivînek çêkir. Xanima min çû nav ciyan û ez li ber derî rûniştim.

Ji evîna wê, dilê min diperitî û laşê min dişewitî. Lê Xwedê dizane, tu tiştê xerab ne dihat bîra min. Çawa bihata? Keça axê min xwe sipartî bû min û li bin parastina min bû! Welê dihat min ko Mijgan di nav keriyên min û di keriyên dinê giş de miyeke tekane ye !. Min tucaran ezman wek wê şevê kûr, û stêr wek wê şevê geş ne dîtî bûn. Di canê min û di çavên min de her tişt guhêrî bûn. Çavên min bi nêrînen şaş li tiştan dinêrîn û eqlê min di ezmanên xeyalan de ajnî dikir.

Di vê gavê de deriyê holikê vebû û wek hêva çardeşevî keçika delal jê derket. Ji mayîna xwe; û ji ber nivîna ji pûş û pelaş xew lê çû bû. Hat û li ber agir rûnişt. Min kulavê xwe ji xwe kir danî ser milên wê, agir vêjand û bê deng li cem wê rûniştim.

Şev xweş û hinek hênîk bû. Di dora me de cîhaneke veşartî bê deng şiyar dibû. Di her tiştî de ez livînek dihesiyam; giya mezin dibûn, kulîlk vedibûn, meywe digihan... Dilê wan jî wek yê min hildavêt û xwîna wan jî wek ya min dibeziya... Stêr bi xwe radibûn û rûdiniştin.

Ji tevgera her tiştî ji her dengî, Mijgan ji tirsan

dilerizî û xwe li min dipêçand. Ji nişkê ve di ser serê me re ronahiyeke geş borî. Me serê xwe rakir; Stêrekê reşiya şevê çirand û ji dûrî me ket erdê.

Mijgan bi tirs pirsî: "Ev çi ye?" Min lê vegerand: "Ev giyanek e, dikeve buhuştê". Paşê min şhadeta xwe anî, wê jî şaş şaş li min dinêrî û wek min kir û pirsî: "Hon şivan sihirbaz in?" Min got wê: "No xanimê! Lê em li serê çiyên nêzîkî stêran in, ji lewre em ji xelkê bajaran bêtir bi hal û sirên wan dizanin". Mijgan serê xwe danî bû ser destekî xwe û li stêran dinêrî. Gava min li rûyê wê nêrî min got qey şivana stêran e, ketiye erdê. Bi dengê heyran gote min: "Stêr çiqas pir in, çiqas spehî ne! Min ew tu caran hevqas zehf hevqas çeleng ne dîtine! Tu bi navê wan dizanî şivano?"

Çawa nizanim xanima min! Binêr! Di ser serê me re: Komika sêwiyan e, ji Rojhelat hiltê û ber bi Rojavê diçe. Hinek li Bakur, Termê Mixêl e –heft in- li rastê wan, Dûpişk e, hergav li Bakur e. Li ber me, Kakeşîn e. Hinek li çep; Kerwankuj e; wek stêrka sibehê ye. Ji lewre kerwanek pê xapiya ketiye rê, û bi şev ji sermê qufiliye. Hinek li nivro Lêl e; Dibêjin ko Lêl û Mecnûn hejî hev du dikirin lê ne digihan hev; gava mirine giyanên wan derketine ezmên, yek çûye Rojava, yek jî Rojhelat. Li Zivistanê Mecnûn li zozanan e, û Lêl li germiyan e. Havînê, Lêl tê zozanan û Mecnûn diçe germiyanan û gava ji cem hev derbas dibin digihin hev, hevdu maçî dikin û piştê her yek diçe aliyê xwe.

Di vê gavê de tiştê nerm, sivik û germ ket ser milê min. Ev serê Mijgan bû. Çîrokên min ew lorandi bûn û bê hemdê xwe ew avêti bû xeweke giran. Min qet xwe ne livand. Stêr pir diçirîsîn. Ûsa dihat min ko, cot, cot tîn min pîroz dikin, û bi ken dîsa vedigerin jor. Bi êş û keser min li Mijgan dinêrî, lê tu xerabî û pîsîtî ne dihatin bîra min. Bi tenê bextiyar bûm. Min digot qey çelengtir, spehîtir û xweşiktira stêran dahatiye, xwe daye milê min û li wê vezeliyaye.

Heta derketina rojê Mijganê ez sermest hiştim. Piştê rabû, û bi dîtina rojê weke gulekê vebû û kenî. Li goman, berx dikalin, li ser zinarên bilind kewan dixwendin, li ser xwîna giyayên kesk û taze tîrêjên rojê sor diçirîsîn, û ji fikra ko ezê bextiyariya xwe winda bikim, dilê min ê reben digevizî û bi nalînen kûr û bi keser li wan, li pez, kew û çiyên vedigeriya